# Bultena heftane

# 18/11/2023

Email: **starmalper13@gmail.com**

Facebook:kongra star-مؤتمر ستار

Youtube: kongra.star22@gmail.com

Nûçeyên ji cîhanê

## Edîtora New York Tîmes li dijî şer îstifaya xwe ragihand

Edîtora New York Times a bi xelata Pulitzer Anne Boyer, helwesta rojnameyê ya li hemberî êrîşên Îsraîlê yên li ser Xezayê rexne kir û îstifa kir.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/editora-new-york-times-li-diji-ser-istifaya-xwe-ragihand-42120

Çavkanî:JINHA



## TJK-E: Em ê li dijî tundiya mêr-dewletê jiyanê biparêzin

TJK-E'yê, ragihand ku dê 25'ê Mijdarê li her deverê li qadan û di nava çalakiyan de bin û ji hemû jinan re banga bilindkirina têkoşînê kir.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/tjk-e-em-e-li-diji-tundiya-mer-dewlete-jiyane-biparezin-42169

Çavkanî:JINHA



# Neteweyên Yekbûyî: Sala borî 89 hezar jin hatine kuştin

Neteweyên Yekbûyî ragihand ku sala borî li seranserê cîhanê 89 hezar jin hatine kuştin, nîvê wan ji aliyê hevjîn, bira, bav an jî endamên din ên malbata xwe ve hatine kuştin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/neteweyen-yekbuyi-sala-bori-89-hezar-jin-hatine-kustin-42213

Çavkanî:JINHA



**Rojhilata navîn**

## Çalakiyên li Suweydayê di meha çaran de didomin

Jinên ku tevli tevgera gel a li bajarê Suweydayê didome bûne, dan zanîn ku heta daxwazên wan bi cih neyên dê dest ji têkoşîna xwe bernedin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/Calakiyen-li-suweydaye-di-meha-caran-de-didomin-42119

Çavkanî:JINHA




## Cezayê girtîgehê li Hamîda Zareyî hat birîn

Aktîvîsta Hemîda Zareyî ya ku di meha Hezîranê de ji ber hinceta li dijî qanûna hicaba ferzkiri derketiye salek cezayê girtîgehê lê hat birîn.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/cezaye-girtigehe-li-hamida-zareyi-hat-birin-42116

Çavkanî:JINHA



## 'Divê ji jinan re di qada sînemayê de derfet bên dayîn'

Lêkolînera Tûnisî Ensaf Wahîba, bal kişand li ser hebûna jinan a di qada sînemayê de û xwest jin zêdetir ji bo hilberînê bên teşwîqkirin.

https://jinhaagency.com/ku/cand-u-huner/ensaf-wahiba-dive-ji-jinan-re-di-qada-sinemaye-de-derfet-ben-dayin-42113

Çavkanî:JINHA




## Şîrînahiya makrot ji Tûnisê belavî tevahiya cîhanê dibe

Halîma Al-Barraq a Tûnisî ku yek ji şîrînahiyên bi nav û deng ê Afrîkayê îmalata makrot çêdike, dixwaze vê şîrînahiyê li hemû cîhanê bide nasîn.

https://jinhaagency.com/ku/ked-u-abori/Sirinahiya-makrot-ji-tunise-belavi-tevahiya-cihane-dibe-42108

Çavkanî:JINHA



# Jinên astengdar dixwazin cudakarî ji holê rabe

Endama Foruma Mafên Jinan û Wekheviyê ya Mexribê Samîra Bakhitî bal kişand ser pirsgirêkên ku kesên astengdar bi taybetî jin li Mexribê dijîn, xwest cudakarî bi dawî bibe û got: “Astengdariya esasî ne ya fizîkî feraseta şaş a civakê ye.”

https://jinhaagency.com/ku/rojane/jinen-astengdar-dixwazin-cudakari-ji-hole-rabe-42107

Çavkanî:JINHA



# Meclîsa Îştar a Mexmûrê 13’emîn konferansa xwe li dar xist

Meclîsa Îştar a Wargeha Penaberan a Şehîd Rustem Cudî Mexmûrê bi dirûşmeya ‘Bi Jina Azad Re Ber Bi Pêşerojek Azad Ve Bimeşin’ 13’emîn konferansa xwe lidarxist.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/meclisa-Istar-a-mexmure-13-emin-konferansa-xwe-li-dar-xist-42126

Çavkanî:JINHA



## [Jinên Libyayê banga piştgiriya bi jinên Filistînê re kirin](https://jinhaagency.com/ku/rojane/jinen-libyaye-banga-pistgiriya-bi-jinen-filistine-re-kirin-42132)

Jinên Libyayî gotin ku êrîşên Îsraîlê yên li ser Xezayê ku bi hezaran sivîlan dike hedef 'felaketek e' û ji bo piştgiriya bi jinên Filistînê re banga seferberiyê kirin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/jinen-libyaye-banga-pistgiriya-bi-jinen-filistine-re-kirin-42132

Çavkanî:JINHA



## ['Desthilatdarî naxwaze huner di civakê de hişyariyê ava bike'](https://jinhaagency.com/ku/rojane/desthilatdari-naxwaze-huner-di-civake-de-hisyariye-ava-bike-42130)

Li Başûrê Kurdistanê her diçe tundiya li hemberî jinan zêde dibe. Têkildarî mijarê hunermend Rûbar Ehmed diyar kir ku ji hikûmetê tu piştgiryê nagirin û diyar kir ku desthilatdarî naxwaze civak bi hunerê hişyar bibe.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/desthilatdari-naxwaze-huner-di-civake-de-hisyariye-ava-bike-42130

Çavkanî:JINHA



## [Derhêner Steffi Niederzoll: Min zilma li ser jinên Îranê anî ziman](https://jinhaagency.com/ku/cand-u-huner/derhener-steffi-niederzoll-min-zilma-li-ser-jinen-Irane-ani-ziman-42139)

Di Festîvala Navneteweyî ya Jinên Sale de, derhêner Steffi Niederzoll bi belgefîlma ‘Li Tahranê heft zivistan’ ku çîroka Reyhane Cabbarî ya Îranî vedibêje xelat girt got ku bi fîlma xwe xwestiye zilm û zexta li ser jinên li Îranê nîşanî civakê bide.

https://jinhaagency.com/ku/cand-u-huner/derhener-steffi-niederzoll-min-zilma-li-ser-jinen-Irane-ani-ziman-42139

Çavkanî:JINHA




## [‘Tundî li ser jinan bandorekê giran dihêle’](https://jinhaagency.com/ku/rojane/tundi-li-ser-jinan-bandoreke-giran-dihele-42148)

Berpirsa Navenda Guhdarkirina Jinên Mexdûrên Tundiyê yên li Tûnisê Haîfa Zagûanî da xuyakirin ku tundî bandoreke giran a derûnî û civakî li jinan dike û diyar kir ku ew ê di çarçoveya 25'ê Mijdarê de balê bikşînin ser "şideta aboriyê".

https://jinhaagency.com/ku/rojane/tundi-li-ser-jinan-bandoreke-giran-dihele-42148

Çavkanî:JINHA



## ['Li dijî tundiya aborî divê hişyarî bê kirin'](https://jinhaagency.com/ku/rojane/li-diji-tundiya-abori-dive-hisyari-be-kirin-42152)

Jinên ku tevî hemû astengiyan di nava jiyana aborî ya li başûrê Kurdistanê de cih digirin, daxwaz kirin ku li dijî tundiya aborî xebatên bilindkirina hişmendiya civakî bên kirin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/li-diji-tundiya-abori-dive-hisyari-be-kirin-42152

Çavkanî:JINHA



## ['Divê ji bo gelê Filistînê em hîn zêdetir bixebitin'](https://jinhaagency.com/ku/rojane/dive-ji-bo-gele-filistine-em-hin-zedetir-bixebitin-42154)

Endama Yekîtiya Çalakiyên Jinan ya Mexrîbê parezer Aişa Lakhmas diyar kir ku li hember êrîşên Îsraîlê bi gelê Filistînê re di nav hevgirtinê debin û got:"Ji bo ku dorpêç rabe divê em hîn zêdetir kar bikin."

https://jinhaagency.com/ku/rojane/dive-ji-bo-gele-filistine-em-hin-zedetir-bixebitin-42154

Çavkanî:JINHA



## Platforma Jinan a Enqerê banga beşdariya meşa 25’ê Mijdarê kir

Platforma Jinan a Enqerê bi boneya 25'ê Mijdarê daxuyaniyek da û banga tevlîbûna meşê kir û got: “Li hemberî zext, zordarî û tirsê emê bibin dengê aştî, edalet û berxwedanê.”

https://jinhaagency.com/ku/rojane/platforma-jinan-a-enqere-banga-besdariya-mesa-25-e-mijdare-kir-42159

Çavkanî:JINHA




## Di jiyanê de mînaka têkoşîna jinê

AMED - Şîmel Beyîk ku di pêvajoyeke krîza aborî dihat jiyîn de koperatîfa jinan ava kir, derfet dide jinan ku tevli pêvajoya hilberînê bibe.

https://jinpanel.com/kr/HEMU-NUCE/content/view/221652

Çavkanî:JINNEWS



## Tulay Hatîmogullari: Em ê li dijî zihniyeta tarî bi hev re têbikoşin

Hevseroka Giştî ya HEDEP'ê Tulay Hatîmogullari, bi boneya 25'ê Mijdarê di civîna komê de bal kişand ser rewşa jinan û got: “Em ê şaredariyên xwe ji nû ve ava bikin û tiştên ku wan hewl dan hilweşînin ji nû ve ava bikin.”

https://jinhaagency.com/ku/rojane/tulay-hatimogullari-em-e-li-diji-zihniyeta-tari-bi-hev-re-tebikosin-42180

Çavkanî:JINHA




## Du rojnamegerên jin di êrişên Îsraîlê de jiyana xwe ji dest dan

Koalîsyona Jinan Di Rojnamegeriyê Dê (CFWIJ) li ser hesabê ya xwe medyayê dijîtal X’ê ragihand ku di êrişên Îsrailê yên li ser Xezayê de rojnamegerên Filistînî Alaa Taher AlHassanat û Ayat Al Khadour jiyana xwe ji dest dane.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/du-rojnamegeren-jin-di-erisen-Israile-de-jiyana-xwe-ji-dest-dan-42175

Çavkanî:JINHA



## ['Jin êdî dikarin li dijî tundiyê gilî bikin'](https://jinhaagency.com/ku/rojane/jin-edi-dikarin-li-diji-tundiye-gili-bikin-42172)

Seroka Daîreya Jinê ya Buroya Civakî Kewser Hesen diyar kir ku cureyên tundiya li ser jinan zêdetir tên zanîn û jin êdî dikarin ji tundiyê gilî bikin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/jin-edi-dikarin-li-diji-tundiye-gili-bikin-42172

Çavkanî:JINHA



## Parêzer Asli Pasinli: Em li dijî êrîşên li ser jinan şer dikin!

Seroka DAKAH-DER'ê Parêzer Asli Pasinli diyar kir ku li Tirkiyeyê li dijî destkeftiyên jinan şer hatiye destpêkirin û got: "Divê em rê nedin van êrîşan û her dem di nava têkoşînê de bin."

https://jinhaagency.com/ku/rojane/parezer-asli-pasinli-em-li-diji-erisen-li-ser-jinan-ser-dikin-42167

Çavkanî:JINHA



## ‘Di nava du salan de zêdetirî 5 hezar zarokên keç hatine zewicandin’

Seroka Desteya Mafê Mirovan ragihand ku di nava du salan de zêdetirî 5 hezar keç, di temenê bin 18 saliyê hatine zewicandin.

https://rojnews.news/ku/?p=289779

Çavkanî:ROJNEWS



## Li Şengalê jinên Ereb bi boneya 25’ê Mijdarê civîn lidar xistin

Bi boneya nêzîkbûna 25’ê mijdarê Roja Têkoşîna li Dijî Tundûtîjiya li Ser Jinê, li gundê Bîrcarî yê devera Ereban ya Şengalê civînek ji aliyê Meclisa Jin ya Herêma Ereban ji bo jinên Ereb hate lidarxisitin.

https://rojnews.news/ku/?p=289631

Çavkanî:ROJNEWS



## Li Tirkiyeyê tabloya 2023’yan a tundiya li jinê

Di 10 mehên îsal de zêdetirî 250 jin ji aliyê mêran ve hatine qetilkirin. Li herêmên erdhejê jin li hemberî tundiyê bêparastin hatin hiştin. Partiyên ku dixwazin qanûna 6284 ji holê rakin, ketin meclîsa Tirkiyeyê.

https://anfkurdi.com/jin/li-tirkiyeye-tabloya-2023-yan-a-tundiya-li-jine-176057

Çavkanî:ANF




## ‘Li dijî êriş û tundiyê xwe birêxistinkirin divê’

Endama Koordînasyona Meclisa Îştar a Mexmûrê Xurbet Îşlek diyar kir ku 25’ê Mijdarê ‘nîşaneya têkoşîna jinan e û destnîşan kir ku hêza jinan dikare hemû êrişên li ser jinan bide rawestandin û divê xwe di hemû aliyan de bi rêxistin bikin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/li-diji-eris-u-tundiye-xwe-birexistinkirin-dive-42200

Çavkanî:JINHA




## ['Zihniyeta mêr li Mexribê li pêşiya jinan di warê siyasetê de dibe astengî'](https://jinhaagency.com/ku/rojane/zihniyeta-mer-li-mexribe-li-pesiya-jinan-di-ware-siyasete-de-dibe-astengi-42204)

Aktivîsta mafên mirovan Hatîce Rabah, diyar kir ku zihniyeta mêr li Mexribê jinan ji derveyî xebatên siyasî dihêle û xwest wekheviya jin û mêr di zagonan de bikeve bin temînatê.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/zihniyeta-mer-li-mexribe-li-pesiya-jinan-di-ware-siyasete-de-dibe-astengi-42204

Çavkanî:JINHA



## [Berhemên Gulnar Qasimî li Tehranê tên pêşandan](https://jinhaagency.com/ku/rojane/berhemen-gulnar-qasimi-li-tehrane-ten-pesandan-42208)

Hunermend Gulnar Qasimî ku bi berhemên xwe balê dikşîne ser pirsgirêkên civakî yên jinan, pêşangeha xwe ya dawî li Galeriya Walîtiya Tehranê vekir.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/berhemen-gulnar-qasimi-li-tehrane-ten-pesandan-42208

Çavkanî:JINHA




## ‘Ji ber zextên civakî jin li xeta alîkariyê nagerin’

Karmeneda xeta alîkariyê 119 Razaw Elî dibêje ku gelek caran ji ber tirsa civakê jin pêwendî bi vê xetê re danaynin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/ji-ber-zexten-civaki-jin-li-xeta-alikariye-nagerin-42210

Çavkanî:JINHA



## Lîstikvan Hind Sabrî ji Balyozê Niyeta Baş a Neteweyên Yekbûyî derket

Lîstikvana Tûnisî Hind Sabrî ragihand ku wê ji bo protestokirina li dijî gelên li Xezayê dijîn weke ‘çeka şer bikar anîna birçîbûn’ji wezîfeya xwe ya Balyozê Niyeta Baş a Bernameya Xwarinê Cîhanê ya Neteweyên Yekbûyî îstifa kiriye.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/listikvan-hind-sabri-ji-balyoze-niyeta-bas-a-neteweyen-yekbuyi-derket-42216

Çavkanî:JINHA



# [Şanogerên Kurd bi listikên xwe balê dikşînin ser pirsgirêkan](https://jinhaagency.com/ku/cand-u-huner/Sanogeren-kurd-bi-listiken-xwe-bale-diksinin-ser-pirsgirekan-42226)

Li Urmiyeyê şanogerên jin û mêr bi listikên xwe derdikevin ser dikê balê dikşînin ser pirsgirêkên jinan ên civakî û armanc dikin ku di civakê de hişyariyê ava bikin.

[https://jinhaagency.com/ku/cand-u-huner/Sanogeren-kurd-bi-listiken-xwe-bale-diksinin-ser-pirsgirekan-42226](https://jinhaagency.com/ku/cand-u-huner/Sanogeren-kurd-bi-listiken-xwe-bale-diksinin-ser-pirsgirekan-42226)

Çavkanî:JINHA




# [Li Kurdistanê tundiya li jinan: Di salekê de bi dehan kuştin û mirinên ‘bi guman’](https://anfkurdi.com/jin/li-kurdistane-tundiya-li-jinan-di-saleke-de-bi-dehan-kustin-u-mirinen-bi-guman-176196)

Şaxa ÎHD'a Amedê ragihand ku di sala dawî de li Bakurê Kurdistanê bi dehan jin hatine qetilkirin û herî kêm 34 jin bi guman jiyana xwe ji dest dane.

[https://anfkurdi.com/jin/li-kurdistane-tundiya-li-jinan-di-saleke-de-bi-dehan-kustin-u-mirinen-bi-guman-176196](https://anfkurdi.com/jin/li-kurdistane-tundiya-li-jinan-di-saleke-de-bi-dehan-kustin-u-mirinen-bi-guman-176196)

Çavkanî:ANF



## Jinên Başûrî: Em tundiya li ser jinan qebûl nekin

Jinên li Binarê Qendîl û Silêmanî li dijî tundiya li ser jinê daxuyanî dan û diyar kirin ku ew ê bi têkoşînê jiyana azad ava bikin.

https://anfkurdi.com/jin/jinen-basuri-em-e-tundiya-li-ser-jinan-qebul-nekin-176164

Çavkanî:ANF



## Li Koye pêşangehek ji bo berhemên destên jinan hat vekirin

NAVENDA NÛÇEYAN - Li navçeya Koye ji aliyê Rêxistina Oskar ve ji bo 15 jinan pêşangehek ya berhemên dest hat vekirin.

https://jinpanel.com/kr/HEMU-NUCE/content/view/221871?page=2

Çavkanî:JINNEWS



## Li Mîdyadê jinek hat qetilkirin

MÊRDÎN - Li Mîdyadê jina bi navê Gulcan Yeşîlmen ya 24 salî hat qetilkirin.

https://jinpanel.com/kr/HEMU-NUCE/content/view/221888?page=2

Çavkanî:JINNEWS




## Tundiya daraz û mêr: 8 sale yek muxtabek nedît

ENQERE - Zeyno Bayramoglu ji ber şîdeta dewleta-mêr her du linge wê şikestin û 8 sal e derman dibe. Zeyno diyar kir ku li dijî mexduriyeta 8 sale dijî yek kesî hesab nedaye û got bi polîtîka bêcezahiştinê ya darazê re hatiye rû hev û got: "Yek merciyeke ku ez gilî lê bikim tune ye."

https://jinpanel.com/kr/HEMU-NUCE/content/view/221845?page=1

Çavkanî:JINNEWS



## 'Ji bo jiyanek bê tundî ber bi qadan ve'

STENBOL - Endama Platforma Jinan a 25’ê Mijdarê Nazli Andan da zanîn ku îsal di 25’ê Mijdarê de wê li qada MecidiyekoyÊ bin û wiha got: “Di atmosfereke ku şer, xizanî û tundiya mêr heye, em ê  îsal 25’ê Mijdarê dîsa rêxistin bikin û li dijî tundiyê li kolanan bin. Em bang li hemû jinan dikin ku li qadan bin. Çalakiya me wê di 16.00’an de pêk bê.”

https://jinpanel.com/kr/HEMU-NUCE/content/view/221907?page=1

Çavkanî:JINNEWS




## Rêkxistinên Jinan: Emê ji bo hişyarkirina ferdên civakê têbikoşîn

Koma 25’ê Mijdarê bi boneya 25’ê Mijdarê Roja Têkoşîna li Dijî Tundiya li Ser Jinê diyar kirin ku têkoşîna ji bo jinûve bidestxistina nirxên pîroz yên jin û dayikan heta roja me ya îro dewam dike û destnîşan kirin ku têkoşîna wan ya ji bo hişyarkirina ferdên civakê didome.

https://rojnews.news/ku/?p=290232

Çavkanî:ROJNEWS



## Festîvala Payîzê li Hewlêrê destpê kir

Li Hewlêrê Festîvala Payîzê bi beşdariya hejmarek jinên xwedî kar dest pê kir.

https://rojnews.news/ku/?p=290223

Çavkanî:ROJNEWS



## Çalakvana Îranî Sîmîarî ya li girtigeha Evînê, dest bi greva birçîbûnê kir

Nasîm Sîmîarî ji ber bêyî ku derkeve dadgehê ev 7 mehe di girtîgeha Îranê de girtiye û ji ber ji mafê xwe yê parêzer girtinê bê par hatiye hiştin dest bi gireva birçîbûnê kir.

https://rojnews.news/ku/?p=289995

Çavkanî:ROJNEWS



# ‘Ji ber nebûna rêveberiya li dijî tûndiyê jin nikarin giliyên xwe tomar bikin’

Li Helebce nebûna Rêveberiya Têkoşîna li Dijî Tûndiya li ser Jinê yek ji pirsgirêkên sereke yên jinên Helebce ye. Ji ber ku ev rêveberî li Helebce nîne, jinên tûndî li beramberî wan tê kirin, nikarin gilî tomar bikin. Her wiha bi zehmetî amarên tûditijiyê yên li Helebce tên tomar kirin.

https://rojnews.news/ku/?p=289970

Çavkanî:ROJNEWS



Nûçeyên herêmî

## [Rêxistina Sara derbarê 25'ê Mijdarê de panelek lidarxist]

Li bajarê Qamişlo di çarçoveya rêzeçalakiyên 25' Mijdarê de, ji aliyê Rêxistina Sara ya Têkoşîna li Dijî Tundiya li Ser Jinan bi koordîneya Meclisa Jinan a Kongreya Îslama Demokratîk ve panêlek hat lidarxistin.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/rexistina-sara-derbare-25-e-mijdare-de-panelek-lidarxist-42115

Çavkanî:JINHA



## 'Divê jin bi jêhatîbûn û hêza xwe bawer bin'

Rana El-Kasmo ya ku li dijî zilma DAIŞ'ê neçar ma koç bike û tevî nexweşiya ku bandor li tevgera wê kiriye jî di Fakulteya Hiqûqê de bi israr e û got: "Divê jin bi jêhatîbûn û hêza xwe bawer bikin."

https://jinhaagency.com/ku/rojane/dive-jin-bi-jehatibun-u-heza-xwe-bawer-bin-42147

Çavkanî:JINHA



# Li Kobanê mêr li dijî tundiya li ser jinan meşiyan

Mêrên ji kantona Kobanê li dijî tundiya li ser jinan meşiyan û bal kişandin ser girîngiya bidawîkirina tundiyê û têkoşîna ji bo azadiya jinan.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/li-kobane-mer-li-diji-tundiya-li-ser-jinan-mesiyan-42174

Çavkanî:JINHA




# Pêyamên zarokan bi navê 'Ji derya dilê me re' hat çapkirin

Di çarçoveya rêzeçalakiyên ji bo kampanya azadiya fizîkî ya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan de Kongra Star pirtûkek ku ji nameyên zarokan hezkirina xwe ji Rêberê Gelê Kurd re diyar dikin bi navê "Ji derya dilê me re" çap kir.

https://jinhaagency.com/ku/rojane/peyamen-zarokan-bi-nave-ji-derya-dile-me-re-hat-capkirin-42201

Çavkanî:JINHA



## ['Jin dikarin ji pirsgirêkên Rojhilata Navîn re bibin hêza çareserî'](https://jinhaagency.com/ku/rojane/jin-dikarin-ji-pirsgireken-rojhilata-navin-re-bibin-heza-careseri-42203)

Sekretera Partiya Sûriyeya Pêşerojê Sîham Davut diyar kir ku ew Sûriyeya rengîn û demokratîk dixwazin û got: “Jin bi rêxistinbûn û nîşandana helwestên xwe dikarin bibin hêza çareseriya hemû pirsgirêkên Rojhilata Navîn bi taybetî pirsgirêka jinan.”

https://jinhaagency.com/ku/rojane/jin-dikarin-ji-pirsgireken-rojhilata-navin-re-bibin-heza-careseri-42203

Çavkanî:JINHA



Kongra Star

25.11.2023